# Peymana nimînendetiyê (Agent Treaty)

§ 1. Ev peyman ji bo parastina mafên nivîskarên kurd û bazarkirin û firotina berhemên wan e.

§ 2. Mafê bikaranînê

a) Mafê Nefelê tenê heye ko berhemên nivîskarî/ê yan jî hinek beşan ji berhemên nivîskarî/ê bi kurdî û bi hemî zimanên biyanî wekî mîkrofîlm, kaset, video, cd, cd-rom, dvd, e-pirtûk (e-book), Internet, antolojî, materyalê dersê, Print On Demand û hemî awayên elektronîk û dîjîtal biweşîne yan mafê weşandina wan bifiroşe hinekên dî.

b) Mafê Nefelê tenê heye ko ji bo nimûne hinek beşan ji berhemên nivîskarî/ê belaş di medyaya kurdî û biyanî de yan jî di Internetê de biweşîne yan bide weşandin.

c) Weşandina pirtûkan ya bi metoda çapa klasîk li ser kaxezê ne li ber hikmên vê peymanê ye.

§ 3. Destheq

Nefel dê ji sedê (% _____) qezenca ko ji firotina mafê weşandina berhemên nivîskarî/ê tê bide nivîskarî/ê.

Nefel dê heqê nivîskarî/ê piştî ko pere ji bikiran (mişteriyan) stand herî dereng di sê mehan de bidiyê.

§ 4. Nisxeyên belaş

Nefel dê ji her berhemeka ko bête weşandin sê nisxeyan belaş bide nivîskarî/ê.

§ 5. Demê peymanê

Ev peyman ji bo pênc (5) salan e û heger nivîskar bi awayekê nivîskî vê peymanê betal neke peyman xwe bi xwe pêncsal-pêncsal dirêj dibe.

§ 6. Betalkirina peymanê

Nivîskar divêt bi nivîskî ji Nefelê daxwaza betalkirina vê peymanê bike û şeş mehan piştî hingê ev peyman betal dibe. Nivîskar nikare peymanên ko berê bi bikiran re hatine kirin betal bike. Nefel kengê bixwaze dikare bi biryareka nivîskî vê peymanê betal bike. Heger nivîskar bimire mîratxwerên wî/wê dibin nimînendeyên wî/wê.

§ 7. Fesixbûna peymanê

Heger Nefel yan jî şirketeka ko karê Nefelê berdewam bike nemîne ev peyman xwe bi xwe fesix dibe û hemî mafên berheman li nivîskarî/ê vedigerin.

§ 8. Berhem

Berhemên ko peyman li ser hatiye kirin ev in:

**1.** ............................................................
**2.** ............................................................
**3.** ............................................................
**4.** ............................................................
**5.** ............................................................

§ 9. Imzakirin

Herdu aliyan ev peyman xwendine û binê wê imza kirine. Tarîx: ...........................

Li ser navê Nefelê

Li ser navê nivîskarî/ê

Imza:

Nav: ..................................................

Navnîşan: ..................................................
..................................................
..................................................
..................................................

tfn: ..................................................

e-poste: ..................................................

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr
120 57 ÅRSTA – SWEDEN

tfn +46-(0)8-508 670 03

e-poste: info@nefel.com
malper: www.nefel.com